

## EL-ELFÂZ EL-MUSTE'MELE FÎ'L-MANTIĞ

**Ebu Nasr el-Farabî**

Tahkîk û ta'lîq Muhsîn Mehdî, Çapa Duyemîn, Daru'l-meşâriq, Beyrut, Lubnan, 1986,

37+87=124 rupel.

**Mustafa ÖNCÜ\***

Ev kitêba hanê ku emê bidin naskirin pirtukeke der heqqê 'ilmê Mantiqêde ye. Wek destpêkekê ye ji 'ilmê Mantiqê re. Ev kitêb pirtuka el Farabîye. Weke ku tê zanîn el-Farabî filozofekî İslamê ê bi nav û denge ku bi navê "Mamosteyê duyemîn" tê naskirin. Lewra "Mamosteyê yekemîn" navê filozofê meşhur Arîsto ye.

Navê kitêbê mîna ku me di ser navê de got **el-Elfâz el-Muste'mele fî'l-Mantiqe**. Mamoste Muhsîn Mehdî tahqîq vê kitêba hanê kirîye. Muhsîn Mehdî li Zanîngeha Şigago mamosteyê lêkolînên 'Erebî û İslamî ye.

Ev kitêba hanê di sala 1986 an de li halî weşanxana Daru'l-meşariq a li Beyrûtê hatîye weşandin. Ev çapa duyem e. Lê bi tîpên latînî ev tarîx wek 1968 hatîye nivîsandin.

Kitêb mutesekkilê li du Serbeşên mezin e. Serbeşa yekem wek pişgotina Muhsîn Mehdî der heqqê vê kitêbê de ye, serbeşa duyem jî metna kitêbê bixwe ye.

### **Serbeşa Yekem:**

#### **Mukaddîme/pêşgotin a Muhasîn Mehdî**

Ev beş li rupela 19 de destpêdike û li rupela 37 an diqede. Hetta rupela 19 naveroka kitêbê gelekî berfireh hatîye pêşkêşkirin.

Di vê beşê de muhaqqîq behsa kitêbê dike. Piştî wê, yanê di beşa duyem de metna kitêba ku tahqîq kirîye nivîsîye.

Di muqeddîmê de muhaqqîq kitêbê dide naskirin. Behsa hinek kitêbên mayî ê Farabî dike. Muhaqqîq di vî karê xwe de 4 nusxe dane berhev û tahqîqa vê kitêbê çekirîye. Ev nusxeyên hanê nusxeyên Dîyarbekrê, Feyzullah Efendî, Kîrman û nusxeya Meclîsa şurayê Tehranê ne. Muhaqqîq paşê jî rê û rêbazên ku di vê xebatê de meşandîye behsa wan dike.

Muhaqqîq metna pirtukê li ser nusxeya Dîyarbekrê te'sîs kirîye. Lewra ev nusxa kevinterînê nusxeyên mayîye. Wereqa 71 an û 106 an ê vê nusxeya destnivîsî kirîye nav kitêbê wek numuneyekê. (r.34)

Naveroka pirtukê gelekî berfirehe. Muhaqqîq pirtuk di bin 10 babeta danîye. Di naveroka kitêbêda jî ev babetana yek e yek hejmartîye û nivîsîye.

Li gorî gotina muhaqqîqê vê kitêbê ev kitêb kitaba filozofê mezin û bi nav û deng Ebu Nasr el-Farabî ye. Kitêb der heqqê 'ilmê Mantiqê ye. ev kitêb ne kitêbeka serbixwe ye. Ev kitêb di nav qoleksîyona kitêbên Farabî ê der heqqê Mantiqê de yek hebe. Yanê Farabî di 'ilmê Mantiqê de bi navê " el- Ewsetu'l-kebîr" an jî "el-Muxteseru'l-kebîr" kitêbek

\* Zanîngeha Dicleyê, Zankoya İlahîyatê, Beşa Zimanê 'Erebî û Belağeta wê, Dîyarbekir/ Tûrkîye

nivîsîye. Ev kitêb li 3 beşên sereke pik tê. A yekemîn “et-Tenbîh” , a duyemîn “el- Elfaz” asêyemîn jî “el-Meqûlat”e. (r.28) Ev pirtuka hanê di nav van pirtukên wî de a duyemîne. Ev kitêba wî wek muxteserekê ye. Farabî pêşîyê di kitêbên xwe yên dirêj de berfireh li ser ‘ilmê Mantiqê rawestîyaye. Lê di vê kitêbê de bi kurtasî behsa mijarên ‘ilmê Mantiqê kirîye. Bi rastî mirov kare bibêje ev pirtuka hanê wek destpêkekêye/medxelekê ji bo Mantiqê. Lewra ew kesê ku bixweze dest bi ‘ilmê Mantiqê bike û di vî ‘ilmî kûr bibe divêt pêşîyê vê kitêbê bixwine. Paşê ê karê wî hîn hisantir bibe. (r.24)

Li gorî muhaqqîq tiştêkî dinî herî balkêş ev e ku Farabî di vê pirtuka xwe de li ser giringîya ‘ilmê Nahwê rawestîya ye û behsa têkilîya vî ‘ilmî û Mantiqê kirîye.(r.26)

Berî ku muhaqqîq metna vê pirtuka bêhempa pêşkêş bike di rupela 37 an de behsa hinek rumûzên ku di tehqîqa kitêbê de bikaranîye dike. Weke tîpa “د” ê ku delaletî ser nusxeya Dîyarbekrê dike. (r.37)

### **Serbeşa Duyem:**

#### **Metna Pirtuka Farabî EI- Elfâz el-Muste’mele fi’l-Mantiq**

Metna kitêbê di rupela 40 de destpêdike û rupela 111 dan de diqede. Di nav pirtukêde hinek rupel vala mane. Ji bo vê yekê dipe ku ev hejmarên ku em didin hinek ferq di navbera wan de hebe.

Ev beşa hanê metna kitêbêye. Li 10 beşên sereke pêk tê.

Beşa yekem:(Di navbera rupela 41- 44)

Navê vê beşê“cureyên elfazên ku xwedî wate” ne.

Di vê beşêda Farabî behsa nav, herf û kirdaran dike. Lewra ew hersêkana qismên elfazane. Hinekî muqayesa vana bi ilmê nahwa Yunanî dike. Ka nêrîna ilmê Nahwê û ‘ilmê Mantiqê bi bal elfaza çawaye? Nîqaş dike.

Beşa duyem: (Di navbera rupela 44- 56)

Navê vê beşê “cureyên herfa”ne

Farabî di vê beşêde behsa cureyên herfan dike. Farabî di virde li gorî xwe hinek nav danîne ser herfan. Hinek elfazên ku gorî Nahwê îsmin an jî fi’lin Farabî ewna wek herf nîşan dane. Weke niha مَنَى، كَمْ، لَيْسَ، كَيْفَ، بَعْضٌ، كَلٌّ û bêjeyên wekî din. Ev beşa di nav xwe de bi navê el-Xewalîf, el-Wasita, el-Hewaşî, er-Rewabit hatîye taqşîmkirin. Farabî di virde wateyên van bêjeyan dide û li ser bikaranîna wan di Mantiqêde radiweste.

Beşa sêyem:(Di navbera rupela 56- 59)

Navê vê beşê “ elfazên hevedudanî û cureyên wateyan”e.

Di vê beşêda jî behsa mubteda û xeber, sifet û mewsûf, mewdû’ û mehmûl ê tê kirin. Her weha behsa wateyên kullî û wateyên kesayetî jî hatîye kirin.

Beşa çarem:(Di navbera rupela 59- 65)

Navê vê beşê “ cureyên wateyên kullî” ye.

Di vê beşêde behsa wateyên giştî û ên taybet hatîye kirin. Dîsa behsa wateyên hevpar an jî hevbeş tête kirin.

Beşa pêncem:(Di navbera rupela 65- 77)

Navê vê beşê “ cureyên wateyên kullî ên yekjimar/mufred”e.

Farabî di vê beşê de behsa hinek istilahên Mantiqê û hemla hinekan ji wan li ser hinekan dike. Weke niha new‘/cure, cîns, fasl, ‘araz û xassan disekine. Ji xeynî van tiştan li ser ‘arazê ku ji yekî venaqete, ‘arazê ku vediqete, rêzkirina cîns û new‘/cure yan, faslê zatî/serbixwe û faslê ne serbixwe jî radiweste.

Beşa şeşem:(Di navbera rupela 77- 81)

Navê vê beşê “ cureyên wateyên kullî ên hevedudanî/murekkeb” ye.

Ev beş çîçkî kurte. Di vê derêde Farabî behsa danasîna/tarîf/hadd ê dike. Danasîna tije/tam û danasîna kêr/naqis dike. Danasîna/resm cîns û new‘ê tê kirin. Di vê derê de mirov dibîne ku di dema Farabîde hîn istilahatên Mantiqê baş runeniştine.

Beşa heftem:(Di navbera rupela 81- 86)

Navê vê beşê “ taqşîm/beşkirin û terkîb/hevedudanî”e.

Ev qismê hanê jî gelekî ne dirêje. Di vê derê de behsa Farabî li ser parvekirina new‘ an û li ser terkîpkirinê disekine. Taqşîmkirina ‘araz û xas çawaye ? li ser wê tête rawestin.

Beşa heştem:(Di navbera rupela 86- 94)

Navê vê beşê “ cureyên perwerdehîyê/eqsamê ta’lîmê”e.

Di vê beşê de behsa ew tiştin ku di perwerdehîyê de tîr bikaranîn tê kirin. Di virde qîyas, îstîqra, tasawwur û tasdîq tê kirin. Dîsa danasîna peyva “şey”/tişt û cîh ku lê tîr bikaranîn hatîye kirin. Di vê derê de behsa Arîsto û Eflatun tê kirin.

Beşa nehem:(Di navbera rupela 94- 104)

Navê vê beşê “ ew tîştên hanê ku ji xwendekarê ‘ilmê Mantiqê re divêt/lazim”e.

Farabî di vê derê de behsa hinek tiştên girîng dike. Divêt xwendekar di destpêka xwendinîyê de hîn bibe ku armanca vê kitêbê çîye, sûda wê nav û merteba wê, û rêxistîyê wê kîye? Gerek van tiştana giştikan zanibe.

Di vê beşêde behsa faîda Mantiqê tête kirin. Qîyas û parçeyên wê ên mezintir/’uzma û ên biçuktir/suxra çine? Bersîva van pirsan tê dayîn.

Beşa dehem:(Di navbera rupela 104- 111)

Navê vê beşê “ di ‘ilmê Mantiqê de vebuna nêrîn û fikr û ramanê ”e.

Vê beşa dawîyê de Farabî armanca/xeraz Mantiqê pêşkêş dike. sûd/faîde vî ‘ilmî çîye? Cureyên/ecza vî ‘ilmî çine? Pirsên wek van pirsan tîr bersîvkirin. Farabî di vir de behsa Arîstotles dike û dibêje ku avakirê ‘ilmê Mantiqê ew e. Piştî van deh beşan encam heye.

Piştî ku metna kitêbê qedîya di dawîya metna kitêbê de hinek şîrove li ser metnê hatine kirin. Paşê Çavkanî û duvre fihrista pirtukan û fihrista zanyaran cîh girtîye. Bi vî hawayî ev kitêba hanê ê bê hempa temam dibe.

Çaxa ku mirov li vê pirtukê dinêre mirov kare bibêje ku ev pirtuk wek deatpêkekêye ji bo Mantiqê. Farabî dixweze ku istilâhatên vî ilmî bi zimanê ‘Erebî bide runişandin. Lewra gorî wî zimanê ‘Erebî hîn negîhîştîye dereca ku besîva istilâhên Mantiq û Felsefê bide.

Di pir cîhan de behsa Nahw û Mantiqê û Felsefa Yunan dike. Farabîdixweze ku pir istilâhên Nahwê di Mantiqê de bikarbîne. A rast ew dixweze ku ji zimanê ‘Erebî zimanekî Mantiq û paşê jî Felsefê ava bike. Loma yek cîhan de muqayesa alimê Nahwê û Mantiqê dike. Weke niha peyva كَمْ peyveke Nahwîye, lê di Mantiqê de istilâheke wek كَمِّيَّة ê hatîye çêkirin. Ji كَيْف istilâheke wek كَيْفِيَّة ê hatîye çêkirin. Di vê kitêba hanê mînakên vî hawayî gelek in.

Ev pirtuk pir girînge. Divêt di warê aqademîk de li ser xebat werin çêkirin. Bi taybetî jî ji bo ku istilâhên Mantiqê bi zimanê Kurdî bête runiştin. Paşê jî istilâhên Felsefî bête te’sîs kirin. Avakirina istilâhên Felsefîk bi zimanê Kurdî merhaleke herî zarurî û herî girînge. Ji bo vê yekê Farabî û ev pirtuka wî a ku me li vir da naskirin mînakeke ji bo zimanê Kurdî.